

Ji Kurdan re Çend Pirs

Riza Can

Xwendevanên hêja, ez dixwazim di vê nivîsa xwe د ژو ji we û hemû birayê xwe yên Kurd re, çend pirsan bipirsim. Gotinek bav û kalan heye, dibêjin “Mirov bi pirsê, diçê Qudsê” rastî jî wisa ye. Derwê rastî û çewtîyan bi pirsan û bi lêgerînan vedibe. Eger mirov ji bo jîyana vê cîhanê, zagonên xweza, gerdûna bê ser û bin, pirsan ji hev pirs neke û li pey deriyê pirsan nekeve, - hûn min bibexşînin- dê têkeve dewsa ajalan. Mirov roja ku ji xwe re gotiye “Ez mirov im” ji bo hebûna xwe ji xwe pirs kiriye “Ez kî me, kê ez afirandime” gotiye; li pey vê pirsê, bi hezaran sal li hêzekî gerîyaye, lê ew hêza, an jî ew kesa nedîtiye. Vêca, çi ku ji xwe hêztir dîtiye, ji xwe re kiriye Xwedê û afirandêr. Di destpêkê de, heya dewr û roja Mûsa, mirov ji xwe re sêsed milyon cure-cure Xwedê afirandiye, ta ku Mûsa bibêje :“Xwedê yek e”. Hin kes dibêjin berî Mûsa, Zerdeşt gotiye “Xwedê yek e” lê ez bi xwe ne di wê baweriyê da me. Li gor bawerîya min, di ola Zerdeşt de, du Xwedê hene. Xweda yê qencîyê û Xwedayê bedî û xirabiyê. Her çiqas ku di çar olên Asîmanî, ango semawî de Xwedê û li dij Xwedê, Şeytan jî hebe, lê li gor bawerîya min ola Zerdeşt ji zagonên dîyalektîgê re yekeyek hev tê. Ji ber ku di zagona dîyalektîgê de, du alî hene. Dê û bav, xwîşk û bira, asîman û erd, pêş û paş, şev û roj, ronî û tarî. Ango qet tiştek bi serê xwe ne tek, ango yek e. Ji ber vê yekê divê mirov têkeve kûrahiya vê felsefê, pirsan ji xwe bipirse, ta ku rastiyê derxîne holê. -her çiqas ,ku rastî bê dûwayî û mutleq nebe jî. Xwendevanên hêja, piştî evqas gotinan, ez werim ser hin pirsên me yên hevpar. Gelo em Kurdên îro neviyên kê ne? Me çi wext ji xwe re gotiye “Em Kurd in, welatê me jî

Kurdistan e?” Gelo Gûtî, Hûrî, Kussî, Mîtan, Kardûk, Medya, çikê me bûn? “Vana ji mêj ve bav û kalên me bûn” dibêjin. Gelo wan çi diheband, navê ola wan çi bû û ji çi bawer dikirin? Dibe ku di vê babetê de, îro em rastiyekê dernexînin, ji ber ku dijminan hemû tiştên ku me didin nasîn, şewitandine, talan kirine , birine û kirine malê xwe. Berê gelê Samî, li Afrîka Bakûr hatine welatê me Mezopotamya, Akad Elam, Asûr, Babîl, mala me xira kirine, dûra jî Îskenderê Makedonya û Farisan. Gelo..! di wexta Împaratorîya Medya de , navê ola Medya çi bû? Astiyargersê zalim çi diheband? . Gelo bêbextiya ku îro em Kurd di nav xwe de dibînin, di wexta Astiyagers û Harpagos de ji me re mîrat ma ye? Li milê dî, piştî ji holê rabûna Medya ,em tev kîjan gelî bûn? Di destpêka ola Xaçparêz de, bav û kalên me çi kirin, çira nebûn Xaçparêz? Ji bilî vê, di destpêka sedsala heft, ango piştî sala 612 hîcrî, ola Îslam bi çi rengî hat ket nav gelê Kurd? Kurdan çito ev ol hebandin? Bangeşiya vê olê di nav gelê Kurd de, kê kir? Kê zimanê erebî dizanîbû? Mekezagona Îslam (Quran) di nav gelê Kurd de çito belav bû û çend hezar kesan ew pirtûka xwendin, şîrovekirin û ji gelê xwe da bawer kirin? Gelo gelê Kurd ji ola Îslam re “Tu bi xêr hatî, ji artêşên wê re “Hûn bi xêr hatin Kurdistanê?” got. Gelo...! Bi hatina wan artêşan re, çend sed hezar Kurd hatin kuştin? Çend sed hezar serî û ziman hatin jêkirin, serî kirin ser qazixan di navbera riya Xarpit, Mûş, Sêrt, Betlîs û bajarên din da tîk kirin? Gelo Kurdan di sala 1071 da çira ji Tirkên barbar re alîkarî kirin, bi tev wan leşkerên Bîzans li welatê xwe derxistin, ew birin Anadolê li ser erdê Yewnan kirin xudan dewlet, li serê xwe kirin bela, îro jî di bin zilm û zora wan da dinalin. Welat talan bûye, di dewsa ciyê merdan de nemerd, di dewsa şêran de çeçel, di dewsa bazan de **D.R.(7)**